

JAG
VILL
VETA

MIN DIVÊ BIZANIBIM

EZ BI ÇI RENGÎ DIKARIM
ALÎKARIYA ZAROKÊN TÛŞÎ
SÛCAN DIBIN BIKIM?

Destpêk	5
Mafê zarokan	6
Erkên salmezinan	7
Gilîkirina li cem xizmeta civakî	7
Pêşwazîkirina zarokê	8
Reaksiyonên normal	9
Destek û parastina zarokê di dema gilî de	9
Berpirsiyartiya xizmeta giştî	10
Lênerîna tendurustî û nexweşiyê	10
Rêxistinên îdeel	10
Parastin	11
Ji gilîkirina cem polis heta dadgehê	12
Pêşlêkolîn	12
Alîkarê dozxwaz	12
Nûnerê taybet yê zarokan	13
Jêpîrsîna zarokan	14
Miayeneya doktor û belgeya hiqûqî	15
Stargeha zarokan - Barnahus	15

Mihakeme	16-17
Tezmînat	18
Xesaretndan	18
Sîgorta	18
Tezmînata zerara sûc	19
Tezmînata zerar sûc ya zarokên şahidên sûc	19
Erka dibistanê ya tezmînatdanê	20
Agahiyên pêwendiyê	22
Rêxistinên îdeel	22
Meqam û mercên din	22
Ferhengok	24
Derbarê Meqamê Mexdûrê Sûcan de	26

NAVEROK





DESTPÊK

Herçend mafê her zarokê ye ku di rewşeke ewle de mezin bibe jî gelek zarok di jiyana xwe ya rojane de hem li mal û hem jî li deverên din tûşî şidetê dibin. Rûbirûmana bi şidetê re ji bo herkesî dikare serpêhatiyêke dijwar be.

Ewa ku zarok û ciwan tûşî şidetê dibin yan jî di derdoreke bişidet de mezin dibin hem bi demkinî hem jî demdirêjî dikare rê li ber encamên girîng veke.

Ev broşur derbarê zarokên tûşî şidetê tên de ye. Broşur bi taybetî ji bo wan kesên ku di karên xwe de bi zarokan re dikevîne pêwendiyê de ye, bo nimûne li dibistan, sosyal, lênerîna tendurustî û nexweşiyê yan jî di rêxistinên îdeel de. Mebest bi peyva zarokê herkesê bin 18 salî re ye.

Ji bo xwendin û xwestina agahiyên berfireh têkeve **www.brottsoffermyndigheten.se**.

MAFÊ ZAROKAN

Her cure şidet û destdirêjî dikare zerarên giran bigihîne zarokê û bibe sedema encamên fizîkî û rûhî. Peymana Zarokan û qanûna Swêdê mafê zarokan destnîşan dikin. Xebatkarên di karê xwe de şikê dikin ku zarokê zerarê dibîne, erka wan e xizmeta civakî (sosyalê) agahdar bikin. Ji bo ewlekîrîna mafê zarokan ev gaveke girîng e.

PEYMANA ZAROKAN

Peymana zarokan lihevhatineke navneteweyî ye ku Swêdê îmza kiriye. Peyman bêyî ku mirov cudahiyê têxe navbera zayend, esl, ol û astengdariyê dinivîsîne bê çî mafên zarokan hene. Ji ber ku zarok piranî naziktir in mafê wan yê guhpêdana taybet û starê heye. Peymana Zarokan li ser çar bendên bingehîn ava bûye:



- zarok gişt xwedanê heman mafan e
- di standîna hemû biryaran de berya her tiştî başiya zarokê berbiçav tê girtin
- mafê hemû zarokan yê jiyana û pêşveçûnê heye
- mafê hemû zarokan heye nêrîna xwe bêjin û rêz ji nêrîne re bê girtin.

Li gor Peymana Zarokan mafê zarokê heye ku ji hemû cure şideta fizîkî yan jî rûhî, lênerîna xerab û destdirêjiya cinsî bê parastin. Peyman herwiha destnîşan dike ku mafê zarokan yê wergirtina destek û alîkariyê jî heye.

QEDEXEYA LÊXISTINA ZAROKAN

Li Swêdê bikaranîna şidetê ya bi neyta terbiyekirina zarokan qedexe ye. Bendên lêdanê yê qanûna ceza ji bo zarokan jî derbas dibe. Ev tê wê wateyê ku ne dêûbav ne jî salmezînan din çênabe şideta fizîkî li hember zarokan bi kar binin yan jî rûmeta wan bişkinin. Lêxistina salmezînan ya zarokên biçûk mîna sûcê lêxistina giran tê nirxandin.



ERKÊN SALMEZINAN

Li gor qanûna xizmeta civakî gereke hemû salmezînên ku bi zerardîtina zarokê dihesin yan gumanê jê dibin gilî li cem xizmeta civakî (sosyalê) bikin. Ew kesê ku bi zarokan re kar dike û pê dihesê yan jî şikê jêdibe ku zarokek zerarê dibîne erka wî ye tavlê gilî li cem xizmeta civakî bike.

GILÎKIRINA LI CEM XIZMETA CIVAKÎ

Ji bo gilîkirina li cem xizmeta civakî guman yan jî endîşe bes e. Ango ji bo gilîkirinê pêwîst nake tu delîl hebin ku zarok zerarê dibîne.

Dem a giliyê gumana ku zarok zerarê dibîne li cem xizmeta civakî (sosyalê) tê kirin, erkê sosyalê ye lêbikole bê çî qewimîye. Xizmeta civakî herwiha biryarê dide bê mudaxele pêwîste yan na. Di vekolîna pêwîstiyên zarokê de fokus başiya zarokê ye. Eger xiz-

meta civakî binirxîne ku derdora malê ji bo zarokê talûke ye ew dikarin zarokê tavlê bigrin bin çavdêriyê. Eger xizmeta civakî binirxîne ku zarok dikare li mal bimîne mudaxeleyên din dikarin bikevîne rojevê; bo nimûne malbata pêwendî û destekê. Gava şika hin sûcên giran hebe xizmeta civakî dikare gilî li cem polis yan jî dozgeriyê bike.

PÊŞWAZÎKIRINA ZAROKÊ

Eger mirov rastî zarokekê were û gumana mirov hebe ku ew tûşî şidetê dibe, lêdanê dixwe yan jî bi hin awayên din guh nadinê girîng e mirov wê cidî bigre. Zarok piranî li hember kesên nêzîk ku şidetê li wan dikin wefadar in. Ev jî dike ku zehmet e ew li ser destdirêjyê bipeyivin. Berpirsiyartiya hemû salmezinan e cesaret bikin û ji zarokê pirsra şidetê bikin.

Bi wextdan û guhdarîkirina zarokê ku ew li gor leza xwe behs bike mirov dikare nîşan bide ku mirov serpêhatiyê ji xwe re dike xem û mirov serê xwe pê têşîne.

Weke salmezin divê mirov nîşan bide ku mirov dikare guhdariya serpêhatiya zarokê bike. Pêwist e salmezin li gor başiya zarokê tevbigerin.





REAKSIYONÊN NORMAL

Hemû cureyên tahdeyê şopên xwe li ser zarokê dihêlin. Zarokên ku zerarê dibînin vê bi awayên cuda nîşan didin. Serêşî, zikêşî, ya ku zarok nikare raze, nikare xwe konsentre bike, bi tenê ye yan jî êrîşkar tevdigere dikarin îşaretên berxeteriyê bin. Zarok herwiha dikare bikeve xemokiyê, hestên bêhêvîbûn û sendroma stresê ya piştî trawmayê dikarin bidin der. Birînen fizîkî jî bo nimûne reşbûna laşî û birînen dirandin û xermişandinê li zarokê dikarin diyar bibin.

Zarokin herçend tûşî tahdê tên jî tu îşaret û birîn li wan diyar nabin. Zehmet e mirov mexdûriyeta zarokên ku nîşanên derve li wan xuya nakin keşif bike. Nîşandana reaksiyonê ya zarokan ferdî ye û dibe ku zehmet be mirov reaksiyonan ferq bike. Bê zarok çiqasî di bin tesîrê de dimîne bi kesayeta zarokê, rewşa jiyanê û tora civakî re girêdayî ye. Şideta rûdayî bi xwe û pêwendiya bi sûcdar re jî

dikare tesîrê li reaksiyona zarokê bike.

Şideta di pêwendiyên nêzik de, wek nimûne lêxistina zarokan yan jî destdirêjiya cinsî xwedî cidiyeteke taybet e. Eyn mîna mexdûrên salmezî û herçend sûcdar ne zaroke jî, zarok dikarin xwe gunehkar bibînin û ji ber rûdanê şerm bikin. Gava sûc li malê rûdide ew ji bo zarokê tahdeyê mez-tir e ji ber ku kesê sûcdar û rewşa malê ji bo zarokê normal tê wateya ewlekariyê.

DESTEK Û PARASTINA ZAROKÊ DI DEMA GILÎ DE

Pêdiviya zaroka ku tûşî şidetê bûye bi destek û alîkariyê heye. Ji bilî tora civakî ya derdora zarokê bo nimûne malbat, heval û derdora nêzîk dibe ku pêdiviya zarokê bi zêdetir alîkarî hebe. Ev desteka nû dikare axavtina bi lênerîna dibistanê yan nexweşxaneyê re be, tedawiya li psîkiyatriya zarok û ciwanan (BUP) yan jî pêwendiya bi rêxistineke îdeel re be.

Di şertên normal de ji bo ku zarok destek û alîkariyê ji lênerîna tendurustî û nexweşiyê wergire pejiwandina weliyan pêwist e. Di lênerîna hevbeş de weliyek carina dikare ji bo astengkirina mudaxelayê bikeve nav hewldanan de.

Eger weliyek li dijî hin cureyên destekê û

tedawiyan jî be ku desteya civakî ji bo başiya zarokê pêwist bibîne dikare biryara destekê bide û wan têxe dewrê de.

XIZMETA CIVAKÎ

Erkê xizmeta civakî ango sosyala li şaredariyê ew e ku destek û alîkariyê bide kesê ku tûşî şidetê hatî û xizmên mexdûran. Ev yek bi taybetî jî ji bo zarokên ku tûşî şidetê hatine yan jî bûne şahidên şidet yan jî destdirêjîya ku li kesên nêzîkî wan bûye. Erka sirveşartinê ya karmendên xizmeta civakî heye.

Li hin deveran xebatên destekî yên pisporî hene, bo nimûne navendên destekê yên ji bo ciwan û mexdûrên sûcan û stargeha zarokan (Barnahus) hene. Xizmeta civakî ya li şaredariyê dikare derbarê van xebatên taybet yên ji bo zarokan agahiyên berfirehtir bide.

Li gor qanûna lênerîna ciwanan (LVU) di haletên pir giran de zarok dikare bi zorê bikeve bin çavdêriyê. Desteya civakî ya

şaredariyê daxwaza çavdêriya bi zorê radestî dadgeha îdarî dike. Dadgeha îdarî li dozê dinêre û biryarê dide bê zarokê bigrine bin çavdêriyê yan na.

Di rewşên acil de desteya civakî dikare biryara tavilê girtina bin çavdêriyê bide. Dadgeha îdarî di nava heftiyekê de divê biryarê tesdîq bike.

LÊNERÎNA TENDURUSTÎ Û NEXWEŞIYÊ

Di tedawiya birînan, keşîfkirina birînan ku ji ber sûcan rûdane û belgekirina wan de fonksiyoneke girîng ya lênerîna tendurustî û nexweşiyê heye. Pêwendiya karmendên navenda lênerîna zarokan (BVC) û lênerîna tendurustiya dibistanê bi hemû zarokan re çêdibe. Ev jî mecalê dide ku BVC zarokên tûşî nexweşiyên tînan keşîf bike.

Dibe ku pêdiviya zaroka ku tûşî sûcan bûye yan jî bûye şahida şidetê bi tedawiya fizîkî û rûhî ya li nexweşxaneyê hebe. Zarokên di kirîzê de dikarin destek û alîkariyê ji miayenexaneyên



BUPê yê seranserê welêt wergirin.

Ciwan dikarin serî li miayenexaneyên ciwanan bidin. Li wir pir caran şêwirmend, pîrik, û hemşîreyên ku mirov dikare bi wan re bipeyive û alîkariya mirov dikin hene. Li gelek miayenexaneyan doktor, jinekolog û psîkolog jî peyda dibin. Di malpera www.umo.se de hem şîret û pêşniyaz hem jî agahiyên pêwendiyê yê bi hemû miayenexaneyên ciwanan re hene.

Karmendên lênerîna tendurustî û

nexweşiyê pabendê erka sirveşartinê ne, lê eger gumana wan ya ku zarok tahdê dibîne hebe divê ew li cem xizmeta civakî (sosyalê) gilî bikin. Di sûcên giran yê li hember zarokan de mafê wan heye ku gilî li cem polîs yan jî dozger bikin.

RÊXISTINÊN ÎDEEL

Pêwendiya rêxistinên îdeel bo nimûne nobedariyên mexdûrên sûcan, nobedariyên jin û keçan û rêxistinên mafên zarokan bi gelek mexdûrên sûcan re çêdibe û lewra digel dezgehên ku hene ew alîkarên girîng in. Ew dikarin zanyariyên li ser mafê zarokan bidin, bersiva pirsan bidin û carina sohbetên bi mebesta alîkariyê pêşkêş bikin. Hemû xebatkarên îdeel pabendê erka sirveşartinê ne. Zarok bi xwe dikarin pêwendiyê bi rêxistinên mîna BRIS, nobedariyên keçan yan jî Unga BOJ re deynin.

PARASTIN

Ji bo xurtkirina ewlekariya zarokên ku di bin gef û şidetê de dijîn tedbîrên cihêreng hene. Bo nimûne qedexekirina pêwendiyê, malên bisitar û nasnameya parastî. Hem zarokên ku tûşî sûcan dibin û hem jî eger pêwîst be weliyên wan jî dikarin bêne parastin..

Ji bo ku zarok were parastin girîng e polîs, xizmeta civakî û dibistan di nav pilankirina tedbîran de cî bigrin. Polîs, Daîreya Giştî ya Bacê û Çavdêriya Agahdariyê dikarin şîretên praktîkî bidin bê berpirsiyarê zarokê di jiyana rojane de bi çi awayî dikare ewlekariya xwe û zarokê xurtir bike.

JI GILÎKIRINA CEM POLÎS HETA DADGEHÊ

Dema mirov şika sûc dibe û li cem polîs giliyê vêya dike ev ji bo parastina mafê zarokan û hêwirandina zarokê gaveke girîng e. Wek qaîde hem şirketên sigortayê hem jî Meqamê Mexdûrê Sûcan ji bo lênerîna pirsê û dayina xesaretdanê gilînameyê dixwazin. Mafê serperîşt û her mirovî heye ku ew giliyê gumana sûcan li cem polîs bikin. Karmendên zarokan jî mafê wan heye dema ku sûcên giran li hember zarokê dîtîna giliyê bûyerê li cem polîs bikin.

Li gor gilînameyê polîs yan jî dozger biryarê dide bê pêşlêkolîn were vekirin yan na. Erke polîs û dozger ew e agahiyên pêwendîdar bidine berpîrsê zaroka ku tûşî sûc bûye, eger berpîrs bi xwe ne gumanbarê sûc be.

Giliyê li cem polîs herî hêsanî li qereqola

polîsan ya nêzik yan jî bi telefona 114 14 tê kirin. Bi gilîkirina li cem polîs re baş e ku mirov gilî li cem xizmeta civakî (sosyalê) jî bike da ku ew bikaribin mudaxeyên hevpar bikin

Agahiyên berfirehtir bixwîne: www.poli-sen.se.

PÊŞLÊKOLÎN

Gava polîs yan jî dozger gumana ku li hemberî zarokê sûc hatiye kirin dibe pêşlêkolînekê dide destpêkirin. Di pêşlêkolînê de jêpîrsîna kesê gumanbar, şahid û zarokê dikare were standin

Di jêpîrsîna pêşlêkolînê de mafê mexdûrê sûc heye ku kesekî mîna palpişt bi xwe re bîne. Bi taybetî ji bo zarokan pîr girîng e ku ew kesekî pêbawer bi xwe re bînin. Bo nimûne ew dikare yekî ji malbatê be, hevalek be, kesek ji xizmeta civakî be yan jî kesekî ji rêxistineke îdeel be. Kesekî ku di pêşlêkolînê

de mîna şahid banga wî tê kirin da ku agahiyên bide polîs nikare mîna kesê palpişt were hesabandin.

Di pêşlêkolînê ku temenê dozger bin 18 salî re ye de leza taybet tê kirin û gereke di nava sê mehan de tamam bibe.

Eger dozger di wê qenaetê de be ku têra hukimdana gumanbar delîl hene doz tê vekirin. Piştî dadgeh ji bo mihakemê gazî dike.

ALÎKARÊ DOZXWAZ

Carina mafê mexdûrê sûc yê alîkarê hiqûqî ku jê re dibêjin alîkarê dozger heye. Bi taybetî di sûcên destdirêjiya cinsî û şideta di pêwendiyên nêzik de, lê herwiha di hin sûcên din de jî eger pêdiviyên taybetî hebin alîkar pêwîst e. Piraniya caran alîkarê dozger yê zarokan heye.

Divê welî di zûtirîn dem de ji polîs yan jî dozger bipirse bê îmkana alîkarê dozger heye yan na. Piştî dadgeha destpêkî biry-

arê dide bê mafê zarokê yê alîkarê dozxwaz heye û alîkarekî tayîn dike. Pêşniyaz dikare were kirin bê mirov kê wek alîkarê dozxwaz tercîh dike.

Wezîfeya alîkarê dozxwaz ew e ku di pêşlêkolîn û mihakemeyê de destek û alîkariyê bide zarokê. Alîkarê dozxwaz herwiha dikare doza zarokê bimeşîne û daxwaza xesaretanê bike. Ev alîkarî ji mexdûrê sûcre belaş e.

NÛNERÊ TAYBET YÊ ZAROKAN

Eger gumanbarê sûcê li hemberî zarokê weliyê zarokê be nûnerêkî taybet dikare were tayînkirin. Eger gumanbar kesek nêzîkê welî jî be heman tişt derbas dibe. Dozger daxwaza alîkarê taybet dide û dadgeha destpêkî biryar dide ku mafê zarokê yê nûnerê taybet heye û nûner tayîn dike.

Nûnerê taybet berpirsîyartiya weliyê zarokê digre ser xwe û di pêşlêkolîn û miha-

kemê de mafê zarokê dipaarêze. Bo nimûne nûner dikare biryarê bide bê gereke zarok biçe miayeneya doktor yan na, zarokê bîne jêpîrsîna polîs û di dadgehê de ji bo ku zarok tezmînatê bistîne alîkariyê bike.

Wek nûnerê taybet parêzer, hiqûqzanekî ji buroyeke parêzeran yan jî kesek din tê tayîn kirin. Ji bo vî karî pêdivî bi zanîn, tecrûbê û xisûsiyetên taybet heye.

JÊPIRSÎNA ZAROKÊ

Ji bo jêpîrsîna zarokan jêpîrsêrên perwerdekirî yê polîs hene. Jêpîrsîn bi awayekî wisa tê pîlan- û birêvebirin ku xetera zerardîna zarokê nebe.

Eger serperîşt bi xwe ne gumanbar be û tesîreke xerab li vekolînê neke gereke ew refaqetê bi zaroka bin 15 salî re bike û here jêpîrsînê. Çênabe serperîşt tim di odeya jêpîrsînê de be, lê gereke ew berya jêpîrsînê û piştî berdest be. Eger ji bo şahidîyê gaziya serperîşt hatibe kirin piraniya caran





neminasib e ku ew di jêpirsîna zarokê de jî amade be. Lê eger alîkarekî dozxwaz yan jî alîkarekî taybet yê dozxwaz hebe gereke ew refaqetê bi zarokê re bike.

Jêpirsîna zarokan gereke ji pêwistiyê nebi-teferûattir be. Ji bo ku tarîfeke temam bê wergirtin bê çi rûdaye baş e ku zarok gelek caran were jêpirsîn. Mebesta jêpirsînê ya sereke misogerkirina delîlan e. Jêpirsîn ji bo zarokê dikare dijwar be, lê di heman demê de bi behskirina serpêhatiyê bêhna zarokê jî dikare vebe.

Eger zarok bin 15 salî re be yan jî ji ber sedemên din ew nikaribe di mihakemeyê de amade be jêpirsîna bi reng û deng divê were tomarkirin. Eger wek nimûne gumana dest-dirêjîya giran hebe jî divê mirov li jêpirsîna vîdyoyî bifikire.

LÊNERÎNA DOKTOR Û BELGEYA HIQÛQÎ

Hem ji bo tedawiya birînên zarokê hem jî ji bo belgekirina wan miayeneya doktor girîng e. Gava zarok were agahdarkirin ku tu birîn lê nînin ev dikare jê re bibe bînfirêhî. Eger gumanên ku birîn li zarokê hene hebin erkê serperîşt e zarokê bibe nexweşxaneyê. Ku nûnerekî taybet yê zarokê hebe ew biryara miayeneya doktor dide.

Ji bo ku dozger îspat bike ku li hemberî zarokê sûcek hatiye kirin girîng e ku şop hati-bine misogerkirin û birîn di belgeyeke hiqûqî de hatibe raporkirin. Di sûcên li hember zarokan de piranî doktorê pisporê bijîşkiya zarokan yan jî doktorekî hiqûqî lêkolînê dike û ew ji bo dadgehê dibe rapora hiqûqî.

STARGEHA ZAROKAN - BARNAHUS

Li gelek deverên welêt stargehên zarokan (Barnahus) hene. Di van stargehan de polîs, dozger û karmendên xizmeta civakî (sosyalê) di vekolîna li ser zarokên ku guman tê kirin ew tûşî sûc bûne de hevkarîyê dikin. Carina di nav vê hevkarîyê de nûnerên ji Dezgeha Bijîşkiya Hiqûqî û BUPê jî hene.

Mebest ew e ku zarok were jîngeheke guncandî ya li gor zarokê ku li yek cihî gelek vekolîn werine kirin da ku pêwîst nebe zarok di navbera meqamên cuda de here û were. Li yek cihî sûc dikare were vekolîn, zarok dikare alîkarîyê wergire û were tedawîkirin.



MIHAKEME

Eger dozger piştî pêşlêkolîna temambûyî dozê veke mihakeme vedibe. Zarokên bin 15 salî re nehewce ye tim di mihakemeyê de amade bin. Di şûna amadebûnê de jêpîrsîna ku berê hatiye tomarkirin dikare were nişandan. Eger zarok di mihakemeyê de amade be di jêpîrsîna zarokê de bersûc dikare li odeyeke din be. Hingî bersûc bi riya bilindgoyê (hoparloran) dikare li jêpîrsînê guhdañ bike.

Eger mihakeme behsa tiştên gelekî hasas bike, bo nimûne sûcê destdirêjîya cinsî, hingî dadgeh dikare biryarê bide ku tenê hin kes di salona dadgehkirinê de bimînin. Di rewşên wiha de mirov dibêje mihakeme li pişt deriyên girtî tê kirin.

Gava mihakeme تمام bû dadgeh biryara hukim dide. Aliyekî ku ji hukimê dadgeha destpêkî nerazî be dikare îtiraza biryarê li dadgeha îstinafê bike.

Di malpera bi navê **www.rättgångsskolan**.

se Dibistana Mihakemê ya girêdayî Meqamê Mexdûrên Sûcan de agahiyên berfirehtir li ser pêvajoya dadgehê hene. Dibistana Mihakemê ji bo kesên ku dê biçine dadgehê amadekariyeke baş e.

Salona dadgehê

Maseya dozger
(ji çepê ta rastê):
Alîkarê dozxwaz
Dozswaz
Dozger

Maseya dadger
(ji çepê ta rastê):
Endamê deseteya dadgehê
Endamê desteya dadgehê
Serok
Nûserê protokolê
Endamê desteya dadgehê

Maseya şahid
Şahid

Guhdarên
muhtemel

Maseya parêzer
(ji çepê ta rastê):
Parêzer
Bersûc

TEZMÎNAT

Eger zarokek tûşî sûc bûbe dozger, alîkarê dozwxaz, yan jî nûnerê taybet dikare di mihakemê de doza xesaretdanê bike. Mafê zarokê yê wergirtina tezmînatê bi rêzê wiha ye; Ya pêşî bi riya xesaretdanê, ya duyê bi riya sîgortayê û ya sêyê bi riya tezmînata sûc ya ku delet dide.

XESARETDAN


Zarok ji bo birînên ku bi sûc re derketine dikare tezmînatê bistîne. Eger dadgehê hukim dabe ku bersûc divê xesaretê bide, ev nayê wê wateyê ku pere yekser têne dayin. Sûcdar belkî nikaribe yan nexwazibe pereyan bide. Ji bo ku zarok tezmînatê wergire dezgeha Îcrayê alîkariya mexdûr dike. Hin haletên pir taybet ne têde alîkariya Daîreya Îcrayê belaş e.

SÎGORTA

Eger sûcdar nenas be yan jî kesê hukim xwarî nikaribe xesaretdanê bide dîsa jî mafê zarokê yê tezmînatê heye. Eger sîgortaya zarokê hebe û ew zerarên ji ber sûc bihewîne nav xwe zarok dikare tezmînatê ji şirketa sîgortayê wergire. Dibe ku sîgortayên cuda yê zarokê hebin, bo nimûne sîgortaya zarokan yan jî sîgortaya qezayên li dibistanê. Piraniya caran ev sîgorta tezmînata mesref û birînên mayinde dide. Girîng e piştî rûdana sûc heta mimkun be zû mirov li nexweşxaneyê zerara bûyî rapor kiribe û gilî şandibe şirketa sîgortayê.

TEZMÎNATA ZERARA SÛC

Tezmînata zerara sûc tezmînateke dewletî ye. Dema sêceki rûdabe, bi sûc re zerar li yekî bûbe lê tu merciyên ku tezmînatê bidin li holê nebin dewlet wê dide. Bo nimûne eger sûcdar nenas be, yan jî sûcdarê ku hukim



xwarî nikaribe tezmînatê bide. Eger sîgortaya mexdûrê sûc nebe, yan jî zerar ne di çarçoveya sîgortayê de be carinan dewlet dikare tezmînata zerara sûc bide. Serlêdana tezmînata zerara sûc li cem Meqamê Mexdûrê Sûcan tê kirin.


Ji bo ku tezmînata zerara sûc were dayin, divê wek qaîde gumanbarê destnîşankirî ji dadgehê hukim xwaribe. Di destdirêjiyên pêwendiyên nêz de ev şerteke. Ji bo ku dema sûcdar nenas jî be tezmînata zerarê bê dayin divê lêkolînek hebe, wek nimûne pêşlêkolînek ku nîşan dide zerara li zarokê bûye ne ji ber qezayekê lê ji ber ku tûşî sûc bûye rûdaye.

TEZMÎNATA ZERARA SÛC YA ZAROKÊN ŞAHIDÊN SÛC

Dibe ku mafê wergirtina tezmînatê ya zarokên bûne şahidên şideta di pêwendiyên nêz de hebe. Erkeke dewletê ya tezmînat-

dana zarokên ku bûne şahidên şideta giran di pêwendiyên nêz de heye herçend sûckir bi xwe nikaribe xesaretê bide jî. "Şahidî" tê wateya ku zarokê kiriyara sûc dîtiye yan jî bihîstiye. Ev dikare ew be ku yek ji dêûbavan yan jî kesekî din yê nêzîk lêdan xwariye yan jî hatiye tehdîtirin. Ev dikare jî destdirêjiyeke li hemberî xwişk yan jî bira be. Eger mirov şahidtiya şideta yan jî sûcên cinsî kiribe mafê mirov yê wergirtina tezmînatê heye. Eger yek ji dêûbavan yê din tehdît kiribe yan tiştên hevbeş yê malê şikandibin û zarokê şahidtiya vê kiribe ew dikare tezmînatê bistîne. Divê li rewşê hemûyî bê nerîn lê di destpêkê de li zerar, rûmetşikandin û tehdîta ku ji ber sûc rûdaye were nerîn. Mezinahiya tezmînatê girêdayî giraniya sûcê ku şahidtiya wê hatiye kirine.

Ji bo ku zaroka şahidtiya sûc kiribe bikaribe tezmînatê zerara sûc bistîne piraniya caran divê hukimekî sûc hebe. Divê herwiha awayekî dokumentasyonê jî hebe, bo



nimûne pêşlêkolîn, saloxdana sûc yan hukimê ku nişan dide zarokê sûc dîtiye yan jî bihîstiye.

Agahiyên berfirehtir yên li ser tezmînata zerara sûc û bê serlêdan çawa tê kirin di vê malperê de peyda dibin.

www.brottsoffermyndigheten.se.

ERKA DIBISTANÊ YA TEZMÎNATÊ

Eger li dibistanê heqaret li zarokê hatibe kirin, ji bo ku nikariye zarokê têr biparêze dibe ku dibistan mecbûr bimîne tezmînatê bide. Berya her tiştî divê mamoste yan jî midûr li ser rewşa zarokê were agahdarkirin. Eger dîsa jî zarok alîkariyê wernegire gilî dikare li cem Nûnerê Zarok û Xwendekaran (BEO) ya girêdayî Çavdêriya Dibistanê were kirin û ew pirsê vedikole.





AGAHIYÊN PÊWENDIYÊ

RÊXISTINÊN ÎDEEL

Di Civakê de mafê Zarokan, BRIS

BRIS-telefon: 116 111

BRIS telefona salmezinan: 077-150 50 50

info@bris.se

www.bris.se, www.barnperspektivet.se

Federasyona Nobedariyên mexdûrên Sûcan, BOJ

Telefona nobedariyê: 0200-21 20 19

boj.riks@boj.se, unga@boj.se

www.boj.se, www.ungaboj.se

Komeleya xizmên Zarokên mexdûrên Dest-dirêjiya Cinsî, ATSUB

Tel: 08-644 21 12

info@atsub.se

www.atsub.se

Rêxistina Neteweyî ya nobedariya jin û keçan li Swêdê, Roks

Tel: 08-442 99 30

info@roks.se

www.roks.se, www.tjejjouren.se

Federasyona navendê ya desteka li hem-ber destdirêjiya malbatî, Rsci

Jourtelefon: 08-696 00 95

jour@rsci.nu

www.rsci.nu

Parastina Zarokan - Râdda Barnen

Tel: 08-698 90 00

info@rb.se

www.rb.se

Federasyona Nomedariya Jin û Keçên Swêdê, SKR

Tel: 08-642 64 01

info@kvinnojouren.se

www.kvinnojouren.se, www.tjejjouren.se

Terrafem

Nobedariya ji bo jin û keçên kokbiyanî – destek û şewirmendiya pirzimanî.

Telefona nobedariyê: 020-52 10 10

info@terrafem.org

www.terrafem.org

DEZGEH Û MEQAMÊN DIN

Nûnerê Zarok û xwendekaran li Çavdêriya Dibistanê, BEO

Tel: 08-586 080 00

beo@skolinspektionen.se

www.skolinspektionen.se

Meqamê Mexdûrên Sûcan

Tel: 090-70 82 00

registrator@brottsoffermyndigheten.se

www.brottsoffermyndigheten.se,

www.rattegangsskolan.se

Mifetişiya agahiyan

Tel: 08-657 61 00

datainspektionen@datainspektionen.se

www.datainspektionen.se, www.kränkt.se

Dezgeha Dadgehê

Tel: 036-15 53 00

domstolsverket@domstol.se

www.domstol.se

Daîreya Îcrayê

Telefona bo mişteriyên: 0771-73 73 00

kronofogdemyndigheten@kronofogden.se

www.kronofogden.se

Navenda Neteweyî ji bo Hizûra Jinê, NCK

www.nck.uu.se

Telefona destekê ya NCK heye, Xeta Hizûra Jinê

Telefona nobedariyê: 020-50 50 50

www.kvinnofridslijn.se

Polîs

Tel: 114 14

Di rewşên acîl de: 112

www.polisen.se

Meqamê Alîkariya Hiqûqî

Tel: 060-13 46 00

registrator@rhm.dom.se

www.rattshjalp.se

34 35

Daîreya Bacê

Tel: 0771-778 778

www.skatteverket.se

(Bi riya girêdanka Pêwendî agahiyên kontora nêzîk peyda dibe)

Rêvebirîya Civakî

Tel: 075-247 30 00

socialstyrelsen@socialstyrelsen.se

www.socialstyrelsen.se

Parêzgeh û şaredariyên Swêdê, SKL

Tel: 08-452 70 00

info@skl.se

www.skl.se (Bi riya girêdanka şaredarî û parêzgeh pêwendiyên xizmeta giştî ya şaredariya te peyda dibin)

Miayenexaneyên Ciwanan

Agahiyên hemû pêwendiyên miayenexaneyên ciwanan yê lokal li ser www.umo.se peyda dibin.

Dozgerî

Tel: 08-453 66 00

registrator.riksaklagaren@aklagare.se

www.aklagare.se

Ji bilî van jî awayên din yê alîkariyê hene, bo nimûne navenda desteka ciwanên mexdûrên sûcan û Stargehên Zarokan Barnahus. Ji bo agahiyên berfirehtir li xizmeta civakî ya şaredariya xwe bigere. Li Parêzgeh û şaredariyên Swêdê jî binêre.

FERHENGOK

SÛC

Kiryarek ku li gor qanûnê dikare ceza bigre.

DOZA CEZAYÎ

Sûcekî gumanbar ku diçe dadgehê.

DADGEH

Meqamê ku bo nimûne hukimê suncan dide. Dadgehên giştî: dadgeha destpêkî (merciya yekem), dadgeha îstinafê (merciya duyem), Dadgeha Bilind (merciya dawî).

PÊŞLÊKOLÎN

Vekolîna sûcê ku di bin rêbertiya polîs yan jî dozger de tê kirin.

ALÎKAR - GOD MAN

Kesekî ku li ser navê yekî din tevdigere. Wek nimûne ji bo dayina fatureyan alîkarî dike yan jî li ser navê zarokê daxwaza tezmînata zerara sûc dike. Ji aliyê dadgeha destpêkî ve tê tayînkirin.

SÛCDAR

Kesê ku sûcek kiribe

MIHAKEMEYA SEREKE

Di dadgehê de civîna devkî ji bo girtina biryara dozê. Jê re mihakeme jî tê gotin.

NAVÇÎTÎ

Mexdûrê sûc û sûcdar digel navberekî bêalî hev dibînin da ku li ser bûyerekê û encamên wê bipeyivin. Navçîtî hem ji bo mexdûrê sûc hem jî ji bo sûcdar bi dilxwazî tê kirin.

DOZXWAZ

Di pêvajoya dadgehê de ji kesê ku tûşî sûc bûye yan jî di dema sûc de zerar dîtiye re tê gotin.

ALÎKARÊ DOZXWAZ

Kesekî ku perwerdeya hiqûqî dîtibe, piranî parêzerek ku alîkariyê dide mexdûrê ku tûşî sûcê giran bûye. Mesref ji aliyê dewletê ve tê dayin û ji aliyê dadgeha destpêkî ve tê tayînkirin.

MIEYIDE

Cezayê ku dewlet ji bo sûcekî biryara wê dide. Mieiye dikare xeramet, zindan, hukimê bişert, stara di bin çav de û radestkirina ji bo lênerîna taybet be.

FERMANA CEZA

Dema sûc sivik û pejirandî be dozger dikare biryara ceza û xesaretndanê bide.

NÛNERÊ TAYBET

Kesekî taybet yê minasib, piranî parêzerek yan jî alîkarek hiqûqî ku di pêşlêkolîn û mihakemê de ji dêla serperîştên zarokê mafê zarokê diparêze. Eger serperîşt yan jî kesekî nêzîkê serperîşt ji bo sûcê li hember zarokê gumanbar be dadgeha destpêkî alîkarê taybet tayîn dike.

BERSÛC

Kesê ku ji ber sûc tê tawanbar kirin.

SERPERIŞT

Ew kes yan jî kesên ku lînerîna hiqûqî aydê wan e, ango berpîrsên zarokê yê hiqûqî. Dikare yek ji dêûbavan be yan jî herdu bin, dikare kesekî ku dadgehê tayînkirî jî be (binêre Alîkarê taybet)

DAXWAZ KIRIN

Daxwazkirina ji bo girtina biryarekê.

DOZGER

Hiqûqzanê ku pêşlêkolînê bi rê ve dibe û di pêvajoya dadgehê de nûnertiya dewletê dike.

DOZ

Daxwaza ji dozger yan jî ferdekî da ku dadgeh kesekî ji ber sûckirinê mumahkeme bike.

ÎTIRAZ

Gava hukim ne bi dilê mirov be daxwaza ku dezgeheke bilindtir dozê bigre dest (binêre Dadgeh).



DERBARÊ MEQAMÊ MEXDÛRÊ SÛCAN DE




Sê erkên neteweyî yê Meqamê Mexdûrê Sûcan hene:

- **TEZMÎNATA ZERARA SÛC**
- **FONDA MEXDÛRÊN SÛC**
- **NAVENDA ZANYARIYÊ**

Armanca giştî xebata ji bo pêşxistina mafê mexdûrên sûc, balkişandin û hişyarkirina li ser pêdiviyên wan e.

Di www.brottsoffermyndigheten.se de derbarê mafê mexdûrên sûc, pêvajoya hiqûqî û agahiyên têkiliya bi dezgeh û rêxistinên îdeel re bi gelek zimanan agahî peyda dibe.

Meqamê Mexdûrê Sûcan bi kêfxweşî bersiva pirsên bo nimûle derheqê tezmînatê de dide. Li vê hejmara xizmetê ya dezgehê bigere: 090-70 82 00, di hilbijêrkan de pêl 4ê bike da ku tu bi dabaşnêr yan jî yekîneya zerara sûc re bipeyivî.





BROTTSOFFERMYNDIGHETEN

Box 470, 901 09 Umeå

Tel: 090-70 82 00

registrator@brottsoffermyndigheten.se

www.brottsoffermyndigheten.se